Sal — 3 Hejmar — 64

Duş. 17 Kanûna Pêşîn 1945

Kiriyariya Roja Nû: ji bona erdên Sûriye û Libnanê, 35 lîreyên Sûrî; ji bona welatên din 4 lîreyên inglîzî. Bihayê Hejmarekê; 25 Qemerî.

# ROJA NÛ

Dîwan û gerînendekariya Rojnamê: Bêrût-Birc: Weqif Tabet, Telefona Dîwanê: 74 04; Telefona Mala Xwedîyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojanû

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

## Neheqî-Nelihevhatin

Ecem li hişyariya kurdan hişyar dibin, jê gazindan dikin, Kurdên Iranê li wan vedigerînin û bersîva wan didin.

Welê dixuye ko di Îranê de, di navbera kurd û eceman de, ji ber pirsa Kurdistanê gelşin hene. Ev gelş ketine stûnên rojnaman jî, herwekî xwendevanên me dizanin piştî ko sondxwarî hatine welatê Îranê kurdên wî welatî jî dest bi xwestina heqên xwe kirine; hin kovar û rojname derêxistina û civatine welatparêziyê danîne.

Bawer bikin ev tişt bi eceman xweş ne hatiye û di rojnaman de, di vê babetê de minaqeşeyin çêbûne û çêdibin. Çendek ji wan rojnaman ketine destên me. Di yeke wande, di rojnama «Eres» de; 15 Îlon 1945 hejmar 128, roja Înê, bendeke welê heye ko tê de gotinên her du aliyan, kurd û eceman, hatine eşkere kirin.

Eres di vê bendê de nameke civata kurdan «Komel» belav kiriye. Civata kurdan di vê namê de bersiva rajnameyên farisî dide û daxwazên kurdan bi wan dide zanîn.

Komel, navê civata welatparêzên kurd e. Merkeza civatê di Mehabadê, di erdê ecem de ye û li Iraqê malikên wê hene. Hin cerîde navê civatê bi sê herfan sanî didin; «*K.K.K*» yanî «Komela kominîstên kurd.» Eve benda rojnama Eresê:

### Nexma Istiqlala Kurdistanê A Ne Bixêr

Berî çend rojan di Tehranê de xeberek belav bû. Xebereke welê ko xelkê paxîtextê ê ji her tiştî bêxeber ew hêvî ne dikir Belê Tehrana xafil, Tehrana gunehkar, Tehrana mebhût zanî ko çend serekên kurd, ji lebatên Komelê bê pesaport an rixseteke din e resmî di Tevrîzê re borîne û berê xwe dane Bakoyê.

Piştî midekî dîsan hate zanîn ko yek ji wan kurdan çûye Moskoyê û ên din vegeriyane Kurdistanê. Hizba Komel! Ev nav ji bo xelkê Tehranê tiştekî nû û nûjen bû. Ji lewre xelkê ji hev dipersî, ma ev çi hizb e, armanca wê çiye?

Hin tişt jê hatine zanîn Ji ber ko hin rojnaman da bûn zanîn ko hizba «Komel» hizba daxwazkerên istiqlala Kurdistanê ye. Lê herçî xwendevanên me bi xwe, ji bona wan; pirsa istiqlala Kurdistanê ne tiştekî ewçend nû ye. Ji ber ko me xwendevanên xwe beriya niho jî; li ser vê pirsê serwext kiri bû û di vê babatê de bendin nivîsandi bûn. Em dixwazin wan tiştan, di vê bendê de jî, bi kurtî bînin bîra xwendevanên xwe. Hingê me goti bû: «Heke me ji xwe pirsî, ev nexme, nexma Kurdistanê ji kû û çavan peyda bûye û dest pê kiriye; divêt em guh û çavên xwe bizivirînin paş. Belê divet em vegerin boriya dûr û li paş perdeyên stûr temaşa bikin. Perdeyên ko di beja Ewropayê û di giravcke mezin û nizingî wê bejê de hatine vegirtin. Ev pirs di pişta wan perdan de hate saz kirin û birêve li cihine din belav bûye».

Lê herçî îro û dî vê bendê de, beriya ko em qala Kurdistanê û çê li wan siyasiyên gunehkar bikin ko bi siyasetên xwe ên xwar piştdidin hizba Komelê; û li sebebêu ko dihîlin kurd xwe bavêjin dawa Sovyetistanê, bigerin, em dikin nameke mihim belav bekin.

Di vê namê de ji miletê necîbê Îran re-ko kurd bi xwe birekî wî ye ewçend bi xurtî hatiye dirêj kirin û di heqê wî de tiştine welê bêperde hatine gotin ko em bêgav man hin pirsan jê rakin.

Em dizanin ko xwendina vê namê ji mirovên hesas û îraniyên xêretmend re wê bibe tiştekî dijwar û naguvar. Ji aliyê din dîsan em dizanin ko welatiyên me ên kurd yên ko bi xaka Îranê re bi rabiteyine zexm girêdayî ne û tucaran nikarin wan bendan bibirin; ew jî ji wicûda van bend û hizban wê bêne êşandin û rencandin.

Em hêvîdar in ko bi arîkariya welatiyên xwe em dikarin xwe ji van nexmeyan biparêzin û firehbûna wan bend bikin.

Em îro vê nemaya ko berî çend mehan gihaştiye defterxana me û eslê wê li nik me hatiye hilanîn, belav dikin. Di hejmara tê de, heke hikûmetê mical da me, emê ji perdeke tîz û bilintir bipeyivin.

## BERSIV

### JI ROJNAMEYÊN IRANÉ ÉN FARISI RE

Komela xortên Kurdistanê; di pêşberê êrîşên kustax û bêşerfiya qelemajotinê û ne naskirina heqên miletê kurd de; bêgav maye sikûtê bişkênîne û heqîqetên ko heta niho ne hatine gotin û zanîn bi ziman bike û wan bêxe ber çavan.

Welê dixuye ko rojnameyên farisî yên ko li Tehranê û di bajarên din de derdikevin xwe danîne xewa kêvroşkan û guh na din vingînya balafiran û dengê pêlên radyowan. An ew di cihana Ristem û Sehrab de hêwirîne û bi yad û xiyalên şûr û mirtal û gurzan; xwe dilxweş dikin. Û wextê li ber menqela bafûrê rûdinin xiyal dikin ko girava Serendibê û xalîça hezretê Silêman zemt dikin û bi Ristem re siwar dibin û diçin heta ba padişahê Ev in çend mîsal. Rojnama «Telîranî imrûz» dinivîsîne û dibêje, divêt devê kurdan ji hesin bête tijî kirin û neşriyata wan a bi kurdî divêt bête mehiw kirin.

Yeke din «Nidayî edalet». Ew jî dibêje ko xwendin û nivîsandina kurdî divêt bête bend kirin. Yekî bi navê Ensarî van tiştan, yên ko xweserî mirovên nesax in û ji hezeyanê pêve ne tu tişt in, dinivîsîne û dibêje, bila zemanê çar dîwarên Daryûş bînin bîrê. Iftixar bi îranîtiyê ye; ne bi kurdîtiyê ye. An fikra istiqlalê, wek nesaxiya taonê ji Iraqê şi rayetî wan kiriye.

Wextê ko Ensarî qala çar dîwarên Daryûş dike, bê şik dikeve xewneke şairane û bi neşweya heşîşê mest, ezman û bihuştê di qelemerewê xwe de dibîne, dîwarê Çînê û xendeka Babilê mihasere dike û zora wan kelehan dibe. An Xişayar şah e; û ew çend hespên wî hene ko ava behra Mermerê têra avxwarina wan nake û wextê welê dibîne; berê xwe dide behrê û bi xezeb jê re dibêje: «Xweliserê ezê te edeb kim.

Ma ne heyf e ko di welatên rohelatê navîn û di vî zemanî de; di sedsala bîstan de miletek bi sehwîrên cin û dêwan bijit û sedsala zêrîn xweserî Riza Şahê mezin bizanit.

Ma gelo ev mirovên ha leşkerên hevalbendan û nûçeyên radyo û têlsîzan jî gotinên cin û periyan dihesibînin. Belê, ev mirovên ha yên ko hawîrdora xwe jê bêtir bîr na bin, ji dil reben û bêçare ne. Wextekî rojnameke frensizî karîkatûrek çêkiri bû û tê de wesfê timakariya Şalı Rizayê Mezin dida. Qerar dan ko qutbiriya xwe ji Fransê bikin.

Lê divêt ew bizanin ko ji mefaxirên Îranê, yên ko bi piranî mefaxirên kurdan in û ew wan yên xwe dihesibînin, pêre, entikxaneyên Ewrope û Emerîkê bi eserên kurdan ên hevnare tijî ne û ew îsbat dikin ko kurd xwediyê medeniyeteke kevn in.

Ensarî dibêjit ko ji kurdan re divêt bi îraniyetê iftixar bikin. Heke ev gotin ne hezeyan e, ma çi ye? Em ferz bikin sê milyon û nîv kurd yên ko di Îranê de dijîn bila pê iftixar bikin. Lê heft milyonên din yên ko di Tirkiye. Rûsye, Iraq û Sûriyê de ne ma ew jî digel xelkên wan welatan ên din bi îraniyetê iftixar bikin.

Divêt hon qenc bizanin ko ji niho û pê de; wê nema bêle destûr dayîn ko xwîna xortên kurdan di riya mexsedên we ên pîs de bête rijandin. Belê kurdan çavên xwe bi rûpelên tarixê gerandine û zanîne, herçî fedekariyên ko di qadên Sind û Pencab û di destên nav bera çeman de kirine; ew bi tenê xweşî û mesleheta dijminêu kurdan re bûn.

Êdî kurd dizanin ko dihatin xapandin û xizmeta dijminên xwe dikirin. Siltanên sefewî, xelîfeyên Osmanî û melikin din ji şerûdiya kurdan fêde di. girtin û kurdan ji wan re dinya vedigirt. Lê ev tişt nema tène pê.

Kurd êdî hişyar bûne. Hereketên ko ji sed û sih salî û hir ve çêbûne, wek hereketên Şêx Îbêdil»h, Şêx Ebû-Seîd, Şêx Ihsan Nûrî û selteneta şêx Mahmûd ev hemî ji sefheyên cidalên istiqlala Kurdistanê ne.

*Van cidal û hereketan ji dinya-alemê re kemala kurdan a siyasî dane zanîn. Ji lewre divêt hon ji bizanin ko cenga miletekî xudan deh milyon nifûs; nikare bê netice bimîne.*

*Heke hon hêj nizanin, kurd ji istiqlala xwe re çawan dixebitin, rojnameyên biyanî wek: Ehram, Ehrar, Itihad, Bêrût, Telegraf, û rojnameyên kurdî wek: Roja Nû, Ronahî, Stêr, Riya Teze, Jin, Gelawêj, Dengî Kitlyî Taze, Nîştiman Çiya, Trûske Yekîtiya û Têgûşînê bixwînin û serwext bibin.*

*Miletê kurd yê ko ji bo xatirê Nadir Dehlî û ji bo xatirê şahên sefewî ji we re riyên Qezwin û Tevrîzê mihafeze dikir û li şûna mikafatê dihate nefî kirin Bıcnûrd, Bender-Ebas û deverine Efxanistanê, nema ji we re dibit alet.*

*Miletê ko gelek serdarên şahan vegerandine heta deriyên Tehranê, heft salan Bexda jî destên imperatorên osmanî derêxistine, êrîşa xwe heta bi Isfehanê kirine û ji bo parastina şerefa belgitên eskerî yên ko wergirtî bûn, di deştên Iraq û Libyayê û çiyayên Birxaristan û Sirbistanê û di asêgehên Kurdistan û Azêrbêcanê, de heta dilopa xwîna xwe a paşin rijandiye; êdî nikare li kuştara xwe a dilxiraş laqeyd temaşa bike.*

*Lê giyanê wan mirovan abadin e, ew na mire; û wijdana milet û dewletên mezin nema razî dibe ko ev neheqî dom bikit.*

*Belê ne medeniyet, ne jî insaniyeta îro nikare destûr bide ko ev terzên qirênwistayî dom bikin û bi navê hevnijadiyê hon di talankeriya xwe de pê de herin. Ji milê din, bi hin tiştên ko hon ji biyaniyan hînî wan dibin, li me dehwa serdestiyê dikin û xwe di nav me de zimreke bijarte dihesibînin. Ma hon çawan vê dozê li me dikin. Ma hon nizanin ko êdî di xwîna we de tu pakî ne maye. Xwîna we îro xeliteyek e; yewnan, ereb, mongol, tev de di ser we re derbas bûne.*

*Lê herçî kurd, em dikarin vê dozê bikin. Ji ber ko kurdan bi dilawerî û bi asêbûna cihên xwe xwîna xwe pak hilanîne. Digel vê hindê û bi vi halê xwe hon dixwazin vî miletê sitemdide bêxin teqana feqr û belengaziyê û di nav çar dîwarên Dergûş de bidin jiyandin.*

*Wextê hon pirsa istiqlala Kurdistanê, istiqlala miletekî xwey deh milyon nifûs yê ko li ser erdekî nizingî 500.000 kilometîr çargik rûniştî, seh dikin lê ecêbmayî dimînin. Ma hon nizanin ko miletekî ne ewçend mezin, lê miletekî xwey 3000 nifûsî jî, wek Monakoyê, misteqil e.*

*Werin dev ji van xeyalatan berdin; rastiyê bibînin û ji niho de navbeyna xwe bi kurdan re çêkin da ko sibe bikarin bi minasebetine ticarî û iqtisadî ji erdê wan è zêrxêr berxurdar bibin*

*Lê heke we di nezaniya xwe de pê da erdê bizanin ko di roja hisab û kitabê de poşmanî bê fêde ye.*

**KOMELA XORTÊN KURDISTANÊ**

## Li Cizîrê

### Nûçegihayê me dinivîse;

*— Midîrê maldariyê yê qezaya Dicle Ebdilhemid Efendi El-mifti bi destê s[e] xwînxwaran hatiye kuştin. Cendirme yek ji van girtiye û hêvî heye ko du kesên mayîn ji wexteki nizing de, dê bêne girtin. Peyayên ko ew kuştine dixweslin pereyên hikûmetê talan bikin. Ebdilhemid Efendî miroveki hêja û xwedîqîmet bû. Rehmet û piyariya Xwedê lê bit.*

*— Serekê cendirmeyên Sûriyeyê hatiye Cezîrê û çavê xwe li nobetdarî û karke; riyên Cendirmê gerandine.*

*— Karkerên ko bi kuştina hêkên kuliyan mijûl bibin hatine Cezîrê; bila xebata wan berxurdar bibe.*

*— Bi şabûniyeke mezin hatiye bihistin ko Serekcimhûr Şikrî Beg Qiwetli di biharê de, wê bê xwatirxwaziya Cezîrê. Hêviya me eve ko emê careke din bi dîtina wî dilxweş bibin.*

*— Baranine boş bariyane; wilo dixuye ko sala nû dê bibe sala berekelê.*

*— Serekên eşîrên Kikan û Ezizan çûne Şamê, xatirxwaziya hikûmetê. Riya wan li ser xeyrê be.*

*— Bi himeta mihafizê me è delal û ciwan Ebdilqadir Beg Midanî, li Cezîrê teşxele ne maye; xelk di gund û zeviyên xwe de bi raheti û bi selameti dixebitin Mala Mihafizê nû ava û berxurdar be*

### Rojnameyên Tirkî Dinivîsînin

*— Rojnameyeke tirkiHemşerî qala pirsaKurdistana Îranê dike û dibêje kokurdên Îranê arîkariya Ûrisan dikin, da ko erdê Azirbicanî ji Îranê bête vegetandin û bikeve destê Sovyetistanê.*

*— Ji aliyê din rojnameyên tirkî bi pirsa daxwazên ermeniyan mijûl dibin û dibêjin: heke erment ji erdê me perçeyek dixwazin, bila bên û ji xwe re bibin; ev tişt bi dara zorê çêdibe ne bi gotina.*

*— Ev rojname li ser daxwazên Ûrisa dinivîse: Ûris bi tengavên Stenbol û Çenegeleyê û erdên Tirkyayê ên roheltî zehf bendewar dibin. Ji xwe pirsa Çenegeleyê bûye birîneke xedar. Gelo şereki mezin î din wê destpê bike?*

*— Li gora gotina wezirên Îranê ên şerî û dervekariyê, kurd di Kurdistana Îranê de, dikin asê bibin û bi vê armancê qiwetên xwe saz û tertîb dikin.*

*— Rojnama Ingilîzî Deyli Telegraf dinivîse: Hawirên hikûmeta Iraqê dilirsin ko Kurdistana Iraqê de, bi qesda Istiqlalê; ji nû ve teşxeleyine zor dikarin çêbibin.*

# Tefsîra Quranê

34 - Qabil termê birayê xwe hilgirtî bû piştа xwe û bê hiş digeriya, wê çaxê bi emrê Xuda du qijik hatin pêşberê wî û bi hev re dest bi şerî kirin, gava yekî ji wan hate kuştin, qijikê din bi nikil û peçikê xwe erd koland û qijkê mirî tê de veşart.

Qabil gava ev dît, dilê wî şewitî, hêstirên wî xwîndibûn û ji çavên wi direjihan û wî digot: xwelî li serê min be, hinga qijikekî jî ne bûm; ta ko birayê xwe veşêrim û cinayeta xwe binepînim. Qabil poşman bû, kezeba wî şewitî.

35 - Ji ber vê yekê, me ji lawên Israil re emir daye, ta ko ew bizanin: yê ko mirovekî bê sebeb dikuje, mîna kesekî ye ko hemî mirovên dinê kuştiye û yê ko, arîkariya peyayekî bêsûç dike û wî, bi arîkariya xwe ji mirinê difilitîne; divê bizane ko ew mîna kesekî ye ko hemî mirovên dinê sax kiriye. Li gora emrê vê ayetê tên kuştin, yên ko mirovekî din kuştine an di welatî de fesadî kirine, weke girtina riya xelkê, talankirina wan û bêbextiya milet û welêt.

36 - Yên ko neyartiya Xuda û pêxember dikin û riya xelkê digirin, wan dikujin û talanê wan tînin, ew fesadker in û cezayê wan weke hikmên jêrîn e:

Heke wan mirovin kuştin ew jî tênekuştin, heke wan hem mirovin kuştin û hem jî talanên wan anîn; divê ew berî bênekuştin û piştre bi dar ve kirin, heke wan talanê xelkê anîn lê kesek ne kuştin, divê destê wan ê rast û piyê wan ê çepê wê bêne jê kirin; lê heke sûçê wan bi tenê tirsandina xelkê bû, divê bêne nefî kirin. Ev cezayên hanî, ji wan re kêmasî û perîşaniyeke giran e; û ji bona wan di axiretê de ezabekî mezin heye.

37 - Lê yên ko beriya ko bikevin destê we tobedar dibin, divê hon bizanin ko Xuda di gunehên evdên xwe dibore, Xuda piyar û dilnerm e.

38 - Gelî bawermendino... ji Xudayê xwe tirsiyar bibin û bi her awayî; tiştên ko Xuda ji pêkanîna wan hez dike; li hev bînin, tu cara dest ji gotina rastiyê û kirina qenciyê bermedin, di riya Xwedê da bixebitin; ta ko hon bigehin xelasê.

39 - Heke yên ko kafir bûne; xwediyê malê dinyayê bibana û wî malî bedêla xelasê xwe; ji êşa roja piştdawiyê bikirana, ew ji wan ne dihate qebûl kirin; ji bona wan ezabekî dijwar heye.

40 - Ew dixwazin ji agirê dojehê derkevin lê kesekî nîne ko dikare wan jê derîne. Wan reyeke giran dane ber xwe, ezabê rûniştina wan di dojehê de, wê dom bike

41 - Jin be an mêr be, destê her kesê ko diziyê dike jê kin, ev ewda kirina wî ye û bi emrê Xuda ji mirovên din re ibretek e. Xuda fêris û xudanqudret e.

Destê mirovekî ko ji birçîtiyê tiştekî kêm didize na yê jê kirin

42 - Yê ko gunehkar û ezabdarê nefsa xwe dibe lê hema bi tobê; xwe qenc dike, bila bizane; Xuda ji tobedaran re tobe dide, di gunehên xelkê dibore, Xuda efiwkar û piyar e.

43 - Gelî mirovino... ma hon nizanin ko Xuda xudanê milkê erd û ezmanan e, ew her kesê ko dixwaze diezibîne û her kesê ko dixwaze digihîne efiwa xwe, Xuda bi her tiştî dikare.

44 - Pêxemberê min... xema mirovan yên ko firset kete dest, kufr û bêdînîya xwe aşikare dikin, me xwe, ew bi tenê bi ziman, lê ne ji dil baweriya xwe tînin; û ji cuhiyan qewmek heye ko tên guhdariya te dikin û piştre tiştên ko te ne gotiye dikin stoyê te û wan gotina di nav xelkê de belav dikin û derewan dikin û ji aliyê din diçin li ba cuhiyên Xîberê jî ko ne hatine cem te û ji wan re; ji devê te tiştine dibêjin ko te qet ne gotiye û pê derewan dikin.

Cuhî, geh û gotinên kitêba xwe diguhêrin û ji mirovên xwe re dibêjin: herin ji Mihdmed bipirsin, heke qerara wî li gora xwestina me ye, wê qerarê qebûl bikin, heke no pê qail ne bin. Gava Xuda ezibandina mirovekî dixwaze; tu li ber Xwedê ni karî jê re rêkê peyda bikî; bizane ko Xuda na xwaze dilê hin mirovan ji gunehan paqij bike, û ji wan re di dinyayê de kêmasî û perîşanî û di axiretê de rûreşî û ezabekî dijwar dide.

45 - Qesda wan ew e ko dikin gotina te bibihîsin, mana wê biguhêrin û pê derewan bikin û ew hakimên cuhiyan rişwetê dixwin; bê namûs û şeref in, bêbext in. Gava ew tên dixwazin ko tu di nav bira wan de hikim bikî; tu bi qîma xwe yî; heke dil dikî bike heke no, dev ji wan berde; ko te dev ji wan berda tu zererê wan na gihe te. Lê heger, tu di nav wan de hikim dikî, hikmê xwe li gora edaletê bide, Xuda ji mirovên adil hez dike.

46 - Ma çawan ew tên û li ser dehwayên xwe hikmê te dixwazin, Tewrat li cem wan e û hikmên Xuda di wê de ne. Ma ne were ye? Ko te hikmê xwe da, ma ewê dev ji hikmên Tewratê berdin, wan baweriya xwe bi kitêba xwe ne anîne.

47 - Me Tewrat da dahatin, roniya wê riya baweriyê û hikmên di wê riya edaletê şanî xelkê dide.

Pêxemberên Xuda ên misilman li gora wê, hikmê xwe dan û didin û yên ko ketine riya pêxemberên xwe jî, weke cuhî, xaxam û zanayên di wan, û yên ko Xuda ji wan re parastina hikmên Kitêba xwe siparti bû û dîdevaniyê Kitêba Xuda dikirin, hikmê xwe li gora Tewratê didin. Ne ji xelkê, lê ji min bitirsin û ji bo standina rişwetê, û gihaştina mezinahiya dinyayê, dev ji ayetên min a rast bermedin. Yên ko ne li gora emrê ayetên Xuda hikim dikin, ji kafira ne.

48 - Û di Tewratê de, me ji bo wan nivîsandi bû ko: nefs bi nefsekê, çav bi çavekî, por bi porekê, guh bi guhekî, diran bi diranekî têne qisas kirin û ji birînekê jî li gora imkan û edaletê qisasek heye. Yê ko di heqê qisasê dibore ew jê re dibe kefaret, yên ko hikmê xwe ne li gora Kitêba Xuda didin; ew zalim in.

49 - Me Îsa kurê Meryemê kir ser şopa pêxemberan û me Îsa kir tesdîqdarê Tewratê û me jê re Incîl da, kitêba ko ronahiya riya rastiyê pêş wan dike.

Incîl li mirovên ko ji Xudayê xwe tirsiyar in şîretan dide û riya rastiyê pêş wan dike.

50 - Divê File, di nav hev de li gora Incîlê hikim bikin, yê ko hikmê xwe li gora kitêba ko jê re Xuda da dahatin na de, ew ji fasiqan dibe.

51 - Me ji te re Quran şand ya ko her kesî re şanî rastiyê dide û hikmên kitêbên ko beriya wê hatine dahatin tesdîq dike û hikmên wan diparêze. Gava xudankitêb tên û li ser dehwayên xwe hikmê te dixwazin li gora emrê Xuda ê hatiye dahatin qerara xwe bide û guh me de daxwaza wan, divê tu hikmê xwe li gora emrê Xuda ko ji te re dahatiye bidî.

Gelî mirovino.. me ji we ji her yekî re, ji cuhî, file û misolmanan re şerîet û rêyek da nîşan kirin, heke Xuda bixwesta me hon hemî li ser dînekî bicivanda, lê wî wisa ne xwest û ji we re çend dîn da, ta ko pê mirovên çak û dilrast ji ên ne baş û dilxwar veqetin. Dest bi hev anîna qenciyê bikin û bizanin ko honê vegerin ba Xwedê û bikevin hafa wî û ew ser tiştên ko we bi hev ne dikir hikmê xwe wê bide.

52 - Pêxemberê min.. di dehwayên xudankitêban de qerara xwe li gora Quranê bide û dev ji daxwazên wan berde, çavê xwe veke, bala xwe bide, ew dixwazin ko tu ji hikmên Quranê dûr bikevî; heke ew bi hikmên Quranê qail na bin, bizane ko Xuda seba hin gunehên wan dixwaze ceza û perîşaniya wan bilezîne, bêtirê cuhiyan di kufrê de pê didin erdê.

53 - Gava ew minêkarê qerarekê li gora hikmên dema nezaniyê a berî islamiyetê ne, bizane ko ew di riyakariyê de ne û ji te re bi dev xweş dikin. Ma di hikm û qerardanê de ji bo miletekî dilpak û bawermend; ji Xuda çêtir hakim kî heye?

54 - Gelî bawermendino... bi cuhî û filan baweriya xwe mey nin û wan ji xwe re me kin heval, ew bes hevalên hev û du ne û yên ji we ko hevalîtiya wan dikin, bizanin ko ew jî ji wan in. Xuda miletên zalim na gihîne riya rastiyê.

55 - Tu dibînî... mirovên ko di dilê wan de şik û nifaq heye zû dibin hevalê wan û dibêjin; em ditirsin heye ko dinya biguhêre û hikim bikeve destê wan; lê ne wisa ye; heye ko Xuda ji ser kafiran, ji pêxemberê xwe re nisretê dide. Mekê hate zeft kirin û cuhî hatine kuştin û yên ko nîzîkî cuhiyan dibûn û bi wan re midara dikirin; poşman û riswa bûn.

56 - Gava nifaqê minafiqan aşikare dibe, mirovên bawermend zendemayî dinînin û ji hev û du re dibêjin: ma ew ne bûn ko bi dilekî reş sund dixwar û digot em bi we re ne. Tiştên qenc ko wan minkfiqan pêk anîne pûç dibe û ew bi ezabekî giran têne êşandin.

57 - Gelî bawermendino... yên ji we; ko piştî mirina Bezma Mihemed; ji dînê xwe vedigerin, divê bizanin ko Xuda wê gavê miletekî radike (dide rabûn) ko ew ji Xudayê xwe û Xuda jî jê hez dike. Ew milet bi misilmanan re nefispiçûk û bi kafiran re nefismezin û şedîd dibin û di riya Xuda de cihadê dikin û ji lom û gazinda gazindkeran na tirsin, ew hasiyetên he, ji kerema Xwedê ji wan re hate dayîn, Xuda her kesê ko dixwaze digihîne kerema xwe. Zanîna Xwedê fireh e, dora her tiştî digire.

58 - Sermiyanê we Xuda, rêberê we Pêxember û hevalên di we mirovên bawermend in, yên ko nimêja xwe dikin, zekatê didin û gava xwe ji Xudayê xwe re ditewînin jî, dest ji kirina qenciyê bernadin.

59 - Yên ko ji xwe re Xuda, pêxember û mirovên bawermend dikin heval, ew ji peyayên Xuda ne û peyayên Xuda her serdest in.

60 - Gelî bawermendino... mirovên xudankitêb û dîn-nezanan û yên ko tewz û henekê xwe bi dînê we dikin ji xwe re me kin heval û heke hon bawermend in ji Xudayê xwe tirsiyar bibin.

61 - Gava ezan tê xwendin ew pê tewz û henekan dikin ji ber ko ew bê hiş in, seh na kin.

62 - Bêje, gelî xudankitêbino., ma xeyda we, ne ji ber vê yekê ye ko me baweriya xwe bi Xuda û bi kitêba ko ji me re û bi kitêbên ko beriya me dahatine aniye û em dizanin ko piraniya we fasiq in û em bi kufrê qail ne bûne.

63 - Bêje: ezê ji we re komê mirovên ko gihane cezayê Xuda bidim zanîn; ew ji qewmê cuhiyan her kes e ko ketiye laneta Xuda û Xuda jê eniriye, hinên ji wan meymûn û hinên din jî beraz bûne û yên ko ibadeta Taxût kirine, ew hemî gihane xirabiyê û ji riya rastiyê yekcar dûr ketine.

64 - Gava ew tên nik we dibêjin: me baweriya xwe aniye, lê rastî ev e: ew kafir tên hafa we û ji ba we kafir diçin, tiştên ko ew dilê xwe de vedigerin Xuda pê dizane.

65 - Û tu dibînî ko piraniya wan di kirina guneh û neçeyiyê û di standina rişwet û xwarina faizê de serî ji hev û du distînin; emelê wan çiqas kirêt û bêkêr e.

66 - Çima zana û xaxamên wan destê wan mirovan ji kirina neçeyiyê û xwarina rişwet û faizê bi şûnda na kişînin. Ji kirina wan gunehan re guhnedana zana û xaxamên wan çiqas kirêt û şerm e.

67 - Cuhiyan got: Xuda destgirtî ye. Destgirtî û çavteng cuhî bi xwe ne û Xuda lanet li wan kir. Xuda comerd û keremkar e, destvekiriye, li gora daxwaza xwe nîmeta xwe dide; serhişkî û kufrê wan bi bihistina Qurana ko Xuda ji te re da dahatin hêj bêtir dibe; me xeyd û dijminîtiyê heta roja dawiyê xist nav beyna wan; û her cara ko ew agirê şerî dadidin, Xuda wî vedimirîne û zora wan dibe. Ew her û her dest li fesadiyê dikin; lê Xuda ji fesadkeran hez na ke.

68 - Heke xudankitêban, baweriya xwe bi Xuda bi Quran û bi pêxember bianiyana û ew ji Xudayê xwe tirsiyar bibuwana, me di gunehên wan diborî û me ew digihand buhuştên têr nîmet.

69 - Heke xudankitêban baweriya xwe bi Tewrat, Incîl û Quranê û bi kitêbên Xuda ên din bianiyana, rizqê wan boş dibû û wan ji fêkiyên daran û ji zadên zeviyan dixwarin. Hinên ji wan aqil û adil in, lê piraniya wan tiştên kirêt dikin.

70 Pêxemberê min... hikmên Qurana ko ji te re hate dahatin ji her kesî re bê tirs û perwa bide zanîn; ko te wisa ne kir bizane ko te wezîfa pêxemberîtiya xwe pêk ne aniye; Xuda te ji tadayê xelkê diparêze; Xuda qewmê kafiran na gihîne riya rastiyê.

71 - Bêje: heta ko we baweriya xwe bi Tewrat, Incîl û Quranê û bi kitêbên Xwedê ên din ne aniye û hon li gora emrê wan ne meşiyane, bizanin ko tu hîm û binyada we nîne. Ew ji Qurana ko ji te re da dahatin û ji pêxemberîtiya te dihesidin û pê hêj bêtir gunehkar dibin û kitêba Xwedê inkar dikin. Xema qewmê kafiran me xwe.

72 - Yên ko baweriya xwe anîne û cuhî file an sabiî bûne û her kesê ko baweriya xwe bi Xuda û bi roja piştdawiyê aniye û qencî kiriye, ji bona wan tirs nî ne û ew xemdar na bin.

ne qediyaye

# Feqîr Elî

—3—

Hevalên di wî, bi aqilên wî keniyan û ji xwe re gotin dihin bûye.

Feqîr li şevê di bîrê de li cem pîrê ma, pîrê deriyê Odekê jê re vekir, text têde hene, xwarin jê re anî, wê şevê dilxweş bûn, sibehê, pîrê jê re got: Here, avê ji wan re bikşîne, berî ko tu derkevî, were cem min, piştre here.

Feqîr çû, av ji wan re dagirtin, piştî ko heywanên di xwe avdan, firaxên xwe teje av kirin û jê re gotin: ya Feqîr were derkeve!

Feqîr got: laqê min ne paqij e, ezê xwe bişom piştre, çû cem pîrê, xatir ko jê bixwaze, nêrî, pîrê jê re heft kevirên cewahir dan û jê re got: heke tu ji Bexdayê vegerî, heft lib xurme ji mi re bîne bi xwe re; go: ser çavê min.

Feqîr hat, şerîd bi xwe ve girêda, hevalê wîna ew kişandin, gava derket ser bîrê, go: kanî sed mecîdiyên min; dane yê, ji axê xwe re got: kîsekî bide min, kîs dayê, ew sed mecîdiyên xwe xiste kîs, heft kevirê cewahir xiste cem wan û devê kîs dirût, belê ew nizane ko ev kevir cewher in; nas na ke.

Ji axê xwe re got: mi divê tu, vî kîsê min, bişînî ji xweha min re, bi vî kerwanî ko ji Bexdê hatiye, û kiriye here Helebê. Axeyê wîna ew kîs bir, teslîmî wî kerwanî kir, honê vî emanetî bi xwe re bibin Helebê, bidin Hecî Ebdela, ji xweha Feqîr Elî re ye.

Emanetê wîna bi xwe rê birin bajarê Helebê, yekî ji xulamên xwedîkerwanan ew emanet anî cem Hecî Ebdela, dan xweha wî.

Keçikê kîs vekir û lê nerî, kêfa wê pir hat, nerî ko heft kevirê cewahir tê de ne; kare pê bajarê Helebê bikire. Yek ji wan keviran, anî cem Hecî Ebdela go: ez dixwazim tu vî kevirî ji mi re bifiroşî...

Hecî Ebdela ew kevirê wê bir li sûkê gerand, kesik nikare bi kire. Çar tacir bûn şirîkên di hev ew kevir kirîn. Keçikê her heft kevirê xwe bi vî hawayî firotin. Keçik zana ye; di mek tebê de rabûye, resmik qesrê ji xwe re girt, weka bavê xwe, ji Hecî Ebdela re got: ez dixwazim qesrekê wek wê, tu ji mi re ava bikî.

Hecî Ebdela, erd jê re kirî, û di mehkê de qesrek wek a bavê wê, jê re ave kir. Piştî ko timam kirin, necar anîn, kursî yên di meclisê tê de çêkirîn, her kursîkê navê xwediyê wê li ser danîn.

Hindurê qesrê raxistin ji tejbe ran û ji mehfûran, tu ferq di nav beyna wê û di ya bavê wê da ne ma.

Keçikê got: ya hecî Ebdela, tiştek kêm ne maye, belê ez dixwazim di qulixa li ber devê derî çêkim; ji bona ko esker têde nobetê bikşînin.

Jê re du qulix çêkirin, deh nefer esker, danîn di wan qulixa de, şev û ro nobetê dikişînin. Miaqê wan li ser keçikê ye.

Keçikê derî li xwe girt, ji esker re got: emrî tu kesî tune bê cem min. (Her sibe Hecî Ebdela wê bê ber deriyê wê û ban dikiyê; heger tiştek jê re lazim be, jê re, ji sûkê tîne, dixist selikê û bi şerîtê dikişîne cem xwe.

Ew di vî halî de ne, emê herin ser Feqîr Elî.

Gihan bajarê Bexdayê, malê di xwe firotin, karê di xwe kirin, ko vegerin Helebê.

Barê di xwe bar kirin, gihan bajêr, Feqîr Elî hate bîra wî, ko çawan pîrê tembiya xurma li min kiri bû, min jê re ne bir pere bi min re tune, lazim ezê pars bikim. Ji dû kerwanê xwe vegeriya, hate çarçiyê, bi rêza dikana ket, her dikankê du lib, û sê lib danê, ritilek pê re çêbû; hat gihaşte kerwanê xwe û meşiya.

Xurmê di xwe xistin kîsekî, û bi milê xwe ve daliqand; amin na be, ko deyne ser heywana, dibê, wê hevalên min bixwin.

Gihane ser wê bîrê car din. Car dî her sê kerwan, gihane ser hev, delêlî ban kir, kî wê dakeve bîrê, bi pêncî mecîdî; Feqîr Elî go, ez!

Şerît pê ve girêdan, û jê re gotin: tu xurme bi xwe re bibî kû! go: ez amin na bim, li cem we bihêlim, honê bixwin.

Daket binê bîrê, av ji wan re kişand û got: ezê îşev di binê bîrê de razim.

Çû cem pîrê, ew xurme danê, wê şevê li cem pîrê ma; sibehê rabû, pîrê qutek dayê, û cuzanek dayê, jê re got: heke tu sura wan derxînî, ezê te bikim ax; heke ji te pirsîn, bêje: mi dîtin, li çolekê...

Feqîr dîsa av ji wan re kişand û ew jî derket, sed mecîdiyên din jî, ji wan standin, û meşiyan.

Roja ko gihan Helebê, sala wî qediya, ji axê xwe re got: miaqê min bide min, ezê herim mala xwe.

Axê wî go: ser çava, meaqê mayî dayê. Feqîr çû mala Hecî yê Ebdela. Hecî Ebdela Feqîr dî, kêfa wî pê re hat û jê re got: bimeş, ezê mala te pêş te bikim. Feqîr ma'dê wî xera bû, ji xwe re got: weh, xweha min zewicandine, bi du Hecî de meşiya, heta gihaştin ba qesrê; ban kir xweha wîna, jê re got: va Feqîr Elî hatiye.

Xweha wîna di şibaqê de nerî, kêfa wî pir hat, dakêt derî vekir, go: De were Feqîr Elî, de were mala xwe.

Feqîr Elî ne wêre here hinurê; yeqîn na ke ko ev mala wî ye. Keçikê bi destê wî girt, banî xist jor, û jê re got: ev qesir bi wan kevirên ko te şandi bû me çêkiriye, dilê wî rahet bû.

Wê derê Feqîr Elî quti û cuzdan dan xweha xwe, keçikê lê nerî, cuzdan vekir, nerî ko tije zêr e, her ko digire û vedike tije zêr dibe. Quti vekir, şewqa xwe da hindurê qesrê temam, go: hay... îro dana Xwedê mezin e. Sibehê emir dan bajarê Helebê, miaqê biçûk û mezinan timam li ser me.

Di wî hawayî de, xeber çû Stenbolê cem Siltan, jê re gotin yek li helebê heye, jê re dibêjin Elî beg, miaqê biçûk û mezinên Helebê dide.

Siltan ji wezîrê xwe re got: lazim em herin tecrîbiya wîna bikin. Kuncîlê feqîra li xwe kirin û berê xwe dane bajarê Helebê.

Nêzîkî bajarê Helebê bûn. keçka Siltan remildar e. Di remla xwe de dî ko bavê wê û wezîrê xwe, sibe bigehine Helebê. Ji

PÊJINÊN DINYAYÊ

Mirovên pêşveketî, miletên bervehatî ji xwe re bajar û şaristanine çeleng û spehî, fireh û dilruba ava dikin, riyên van bajaran esfeltkirî ne; di van şaristanan de, xwendegah û zanisteyine mezin hene; bajarên wilo bi xestexane, bi ibadetgeh in; têde hotelên qenc, xwarinxaneyên baş hene; dora şaristanan têr destgeh û febrîqa ne; eve şaristanekî wilo.

Feqîr Elî re got: sibe tuê herî devê riya ko jê dê bên.

Gava tn wana bibînî, libsê feqîra li wana ye, ji wan re bêje: kerem kin, wana bîne mal.

Sibehê Feqîr Elî çû devê riya ko jê de bên, carekî nerî, ko du feqîr ji wê ve tên. Feqîr Elî qedimî, destê her diwa maçî kir û go: keremkin ya feqîrên delal, emê herin mala mel.. Adeta we latê me wilo ye.Siltan û wezîrêxwe pê re meşiyan, nêzikî qesrê bûn, Siltan li wezîrê xwe fitilî, û jê re got: mi ji te re go, emê herin Helebê, te em vegerandin Stenbolê car din; ev qesra min e. Wezîr jê re got: ya Siltanê min, ev der Heleb e, ne Stenbol e, gava bi derenca ve banî ketin, dinere ko tejber û mehfûr wek ê wîna ne; banî ketin jor, li ser kursiyên miclisê rûniştin, li pişt nerî, ko navê wî li ser kursiyê ye; go: ya wezîr, ma mi ji te re ne go ev der Stenbol e ?

Wezîr go: ev der Heleb e, ne Stenbol e. Elî beg çû cem keçkê, jê re got: va.. me anî ne.

Keçikê jê re got: ezê herim cem wan, kuncîlê xwe ê minasib li xwe kirin, du fincan qehwe, danîn ser sînîk zêr ûçû cem wana.

Gava Siltan keçka xwe dî, nas kir, serê xwe xist ber xwe.·

Keçikê ban kiriyê, go: serê xwe rake, nayê bîra te roja ko te ez tazî bî Feqîr Elî re şandim; te dî çawan Xwedê ê ko ji te cêmêrtir e; da me, roja ko mi, ji te re digot: ji te camêrtir heye, tu dixeyidî; li wê derê Siltan, destê keçika xwe maçî kir û got: xeber a te ye !

Keçikê jê re got: heyanî niha ez û Feqîr Elî xweh û birayê hev in û me diva bû ko tu bê vê derê, ji bona mehra min.

Qadî û miftî anîn, mehra wana li hev du birîn û ewgihan miradê xwe, keçikê ji Feqîr Elî re got: lazim em xelatê wan bidine wan, cuzdan dan Siltan, û qutî dane wezîr. Siltan pir dilxweş bû ji wan, û ji Elî beg re got: bajarê Helebê di bin hikmê te de mal tu xera bikî, tu ava bikî, tu zanî...

Hew çîroka me xelas bû serê xwendekaran xweş be.

**Silêman Hesen Mercê**

## Kitêbên Dawîn

### Yên ko qala pirsa Kurdistanê dikin

*Di vê dawiyê de, li ser pirsa Kurdistanê, sê kitêb hatine çap kirin, û her sê ji bi zimanê erebî hatine nivîsandin, û li Bêrûtê ketine firotinê.*

*Navê van kitêban û nivîsevanên dî van :*

*— El - Ekrad - fî - Libnan û Sûriye. Bi qelema Dr. Edîb Mihewed. Bihayê wê sed qirûşên libnanî.*

*— Kurdistan - ew - Bilad - el - Ekrad. Bi qelema Seyda Yûsif Malik, xwediyê rojnameya Esra. Bêrût; Sendûq - el - Berîd: 857. Bihayê wê sed qirûşên libnanî.*

*— El - Qediyet - el - Kurdiye; beyin - el - ems - we - l - yewim. Bi qelema Dr. Mihewed. Bihayê wê sed qirûşên libnanî. Adrêsa Dr. Mihewed: Milik Debis; Terîq - Ebdil - basit - el - Faxûrî; Bêrût; Libnan.*

# MIRÉKA CIHANÉ

*Rêhesinên Ewripayê dı vî şerî de xesarine zehf mezin dîtine; bi hezaran kilomêtir rêhesin bi bombeyên balafiran û bi dînamîtê hatine xira kirin; îro ko şer qediyaye û raheti vedigere Cihanê dewletan dest bi selihandina rêhesinên xwe kirine; wêneya jorîn xebateke wilo pêş me dike.*

*Ji avahiyên erdê Ewripayê: Ibadetgehek.*



*Gasingeha Stêrê, û Kevana Serfirazigê.*

*Şam bajarekî zehf şîrîn e; em kur dibêjin Şam şekir e, û bitenê welat jê şîrîntir e; ji bergehên Şamê, ên delal camiyek.*

### Cigareyên Tamdar

Cigareyên çêtir û tamdar, yên Rejiya Libnan û Sûriyeyê ne, Jokey-Klub, Yekemîn, Befra. Tatli-Sert, Vircinya, Oriyen, Zodiyak; ev cigareyên he hemî, ji titinêu çêtir û paktir têne çêkirin. Pişti xwarinê cigareke baş, dilê cigarevxwaran vedike.

Gava dixwazin cigarekê vexwin, navên Jokey-Klub, Yekemîn-Birincî, Befra, Tatli-Sert, Vircinya, Oriyen, Zodiyak bînin bî ra xwe û yek ji wan paketan, ji xwe re bibijêrin.

## ÇAPA KURDI

*Niho bi zimanê kurdî hevde kovar û rojname derdikevin. Ji van pê ve, li Bêrûtê, her panzde roj carekê, bi zimanê frensizî rojnameyek derdikeve; navê wê « Le jour Nouveau » ye; çar rûpelên di wê ên mezin hene. Ev rojname qala çand û nivîsar û siyaseta Kurdistanê dike û doz û dehwa milelê Kurd, têxe pêşçavên cihanê. Ev in navên kovar û rojnameyan û welatên ko tê de têne çap kirin. Li Sovyetistanê: Riya Taze, Kovara Qefqasê.*

*Li Iranê: Peyam; Nîştiman, Kûhistan, Zegros. Çiya, Tîrêje, Yekîtiya Têgûşîn*

*Li Iraqê: Azadî, Jiyan, Gelawêj, Dengî - Kitlyî - Taze.*

*Li Şamê: Hawar, Ronahî.*

*Li Bêrûtê: Stêr; Rojû Nû.*

## RADYO

Weşînekên heroje bi zimanê kurdî :

**Li Bêrûtê:**

Radyoa Bêrûtê; hero pişti nîro, li saet pênc û sih deqîqan de, li ser pêlên kurt û navîn bi zimanê kurdî nûçeyên Cihanê ên dawîn belav dike. Dirêjahiya pêlan: pêlên kurt 37 mêtir û 34 sentîmêtir, an 8.036 kilo sikil; pêlên navîn 411 mêtir, an 730 kilo sikil.

**Li Bexdayê :**

Hero pişti nîro di saet çaran de, destpê û heta pêncan dom dike. Dirêjahiya pêlan: 42 mêtir û 37 sentîmêtir; pêlên kurt.

**Radyoa Kurdistanê ;**

Li ser pêlên kurt diweşîne; dirêjahiya di wan; 42 û heta 44 û nîv mêtiran; berî nîro li saet 11 û 45 deqîqan de, dest pê dike; û nîv saet, dom dike.

**Radyoa Azirbîcanê ;**

Hero pişti nîro der saet pêncan, li ser pêlên dirêj bi kurdî diweşîne. Pêlên dirêj: 1410 û heta 1415 mêtiran. Ji van pê ve hin radyoyên dinyayê stranên kurdî diweşînin; mîna yên Moskowa, Erîwan Paris û Londrê.

**Strana Kurdî:**

## Heftsedê

Lê warê....
Erê Heftsedê, dotmama Genc
Xelîl Axa ji xewka şîrîn hişyar bûye.
Bi sê denga bi dengê zîzî li jin babê xwe dikit, qîrîn û hawar û gazi ye.
Dibit: «Erê, jin babê, xewnekî min dîtiye:
Cotekî ava li ber darê geneka Bîracûkê mala babê min zenzeliye;
Cotekî spîndara li ber de şîn bûye;
Cotekî reşmara pê ve hatiye;
Mehfûrek î sor î Xorisanî li bin daniye;
Kerekî beqala bi sê linga hêdî hêdî xwe li sera gihandiye;
Kewekî spî zimzim kirî, li serê zinarî di xwendiye;
Teyrekî başûkî li serê kewekî dabî, kewekî firandiye.
Dilo, ne ma yê...
Dê bila ne mînim bo siwarê xerîbiyê....
Lê warê....
Jinbabê dibêjit:
Erê, keça min Heftsedê, xewna te rast e, derew nîne:
Cotê ava Bêracûkê rondikê çavê te ye;
U cotê spîndara bejna te ye;
Cotê reşmara kezî te ye;
Û cotê sêvê Entabî memkê te ye;
Û mehfûrê sor î Xorîsanî sîng û berê te ye;
Kerê beqalî ew dezgirê te ye;
Kewî spî zimzim kirî, li serê zinarê, ew pismamê te Genc Xelîl Axa ye;
Zimzima li milê rastê giltekî frengî girtiye;
Û teyrê başûkî hatî li serkewekî dabî, kewekî firandiye,
Ew Ezraîl e, li ser rûhê pismamê te Genc Xelîl Axa hazir bûye.
Dilo ne ma o,
Dê bila ne mînim bo suwarê xerîbiyê...
Erê, erê, jinbabê dibêjit:
Keça min Heftsedê, xema ne xwe, xem xirab in.
Şol û teqîr û miqederê di Xwedê ne,
Bi ser te û pismamê te tên û batal nabin;
Çigarekî bikişe, da xema dilê te, pê bilav bin;
Her mirovhewdekî gul û rêhana biçînit û xizmet bikit
Şivê desta ewil her dê ra bit.
Heftsedê dibêjit:
Erê, jinbabê, bi rast e, xema naxwim, xem dê xirab in.
Şol û teqdîr û miqederê di Xwedê ne.
Li ser min û pismamê min Genc Xelîl Axa tên û batal nabin.
Her mirov hewdekî gul û rêhana biçînit.
Û heft cara bi rojê xizmet bikit, Şivê desta ewil her ra ne bin.
Min wê sûnd xwarî:
Kesî pişti pismamê min î Genc Xelîl Axa bi sing berê min şahî nabit
Dilo, ne ma o,
Dê bila ne mînim bo suwarê xerîbiyê...

ne qediyaye

www.kurdakurdi.org